



Tîrmeh 20, 2020

Qeyda veguhastinê destpê kir ji bo sala dibistanê ya 2020-2021

Ji bo pîlankirina bêtir kêrhatî ya xizmetên otobûsê ji xwendekaran re, Xizmetên Veguhastina Xwendekaran a Başûr-rojavayê Ontario (STS) **ji bo xwendekarên ku ji bo xizmetên otobûsê guncaw in qeyda veguhastinê ya mecbûrî** pêşkêş dike. Ev ji bo wan xwendekarên ku .veguhastina taybet ji bo pêwîstiyên xwe yên yekta bi kar tînin, derbasdar nîne

Ji ber sînorkirinên hikûmetê yên li ser hijmara xwendekarên ku dê bikarin li otobûsekê suwar bin, û ji bo piştgirîdayîna hewldanên şopandina temasê da ku şerê dijî COVID-19'ê bê kirin, suwar tenê .dê li gori qeydbûnê bîn cihveqetandin. Li salên pêş, qeydbûna otobûsê otomatîk bû

Rênişanên Wezaretê Perwerdehiyê kapasîteya otobûsan a di nav sîstema veguhastinê de nêzîkî sedî kêr kir. Otobûs an jî ajokarên zêdeyî tune da ku bersiva daxwaza bilindbûyî ya ji ber kêmkirina 60 .rûniştokên heyî bidin eger ku pîvanên mesafeya fîzîkî bîn pêkanîn

Dêûbav û parastvan bi rêya birina zarokên xwe ya dibistanê ya bi erebeyên xwe dikarin bibin alîkar ji bo zêdekirina kapasîteya otobûsê ji bo wan zarokên ku ji bilî otobûsê derfetên wan tune. Malbat dikarin jî piştgirîya rêwîtiya çalak bikin ji bo ku zarokên wan wek peyatî an jî bi bisiklêtê .biçin dibistanê

Xizmeta otobûsê ya dibistanê hawirdoreke hevpar a suwarbûnê ye, li gel gelek xwendekarên ku timamê rojê wê cihê bi kar tînin. Amadekariyên vegera dibistanê dê pêkanînên zêdeyî yên paqîjkirina otobûsan û şandina peyamên ewlehiyê yên ser esasê-civakê bigirin nav xwe, lê dibe ku .malbat dîsa jî ji ber sedemên tenduristî û şexsî nexwazîna xizmetên otobûsê bi kar bînin

Destpêka hefteya 20'ê Tîrmehê, STS ê emailê bişîne malbatên xwendekarên ku ji bo veguhastinê guncaw in ku ji niha ve qeyda xwe ya dibistanê ya Îlonê çêkîrine. Di nav emailê de lînkeke forma .qeydbûna veguhastinê dê hebe ji bo wan xwendekarên ku girêdayî xizmeta otobûsê ne

Piştî 29'ê Tîrmehê, Qeyda Veguhastinê dê bi awayekî online li ser www.mybigyellowbus.ca berdest be ji bo wan kesên ku email wernegirtine lê qeyda dibistanê çêkîrine û ji bo veguhastinê guncaw in. Carekê forma qeyda Veguhastinê ji aliyê STS ve hat wergirtin, emailêke erêkirinê dê .bê şandin

Dawiya Tebaxê, malbat ê bîn arastekirin ji bo sazkirina hesabeke nû ya Portala Dêûbavan û têkevinê ji bo venêrîna pîlana veguhastinê. Heya wê demê, tê hêvîkirin ku biryara derbarê modela serdema dibistanê bê ragihandin û malbat ê xwedî fîrseteke din bin ka gelo pêwîstiya wan bi .veguhastinê heye

Qeydên veguhastinê di 14ê Tebaxê de xilas dibin da ku beriya destpêkirina dibistanê rêgeh bîn timamkirin. Heya piştî 14'ê Îlonê zêdetir qeydên Veguhastinê dê neyên çêkirin, ta ku suwarbûn û .qeydên dereng bîn serastkirin

Malbat niha divê amade bin bi rêya qeydkirina xwendekarên xwe bo dibistanê û guherînen navnişanê yên heyî ragihînin navenda dibistanê. **Malbat her wisa divê teqez bikin ku ew jimareya nasnameyê ya xwendekar bizanin ku dikarin bi tîkildarbûna bi navenda dibistanê .an jî di Portala Dêûbav a dibistanê de bi dest bixin**



**Southwestern Ontario Student
Transportation Services**

mybigyellowbus.ca
Tel No: (519) 649 1160

Qeydên Veguhastinê divê hemû şert û mercan bînin cih ji bo bidestxistina xizmeta otobûsê. Agahiyên di qeyda Veguhastinê de hatine dabînkirin divê bi qeydên xwendekar ên li nav dosyeya .dibistanê re li hev bînin an jî qeyda Veguhastinê dê bê redkirin

Xeteke telefonê ya taybet a ji bo Qeyda Veguhastinê dê 20'ê Tîrmehê de çalak be ji bo alîkarbûna bi qeyda Veguhastinê û ji bo piştgirîdayîna malbatan ên ku nikarin xwe bigihînin kompîtir an jî .înternetê. Jimareya xetê 519-432-0687 e

:Dîrokên Girîng

Tîrmeh 20	Xeta qeyda Veguhastinê vedibe)519-432-0687(
Tîrmeh 21 - 22	Qeyd ji Pêşdibistanê ta xwendekarên Pola 4 re tê pêşkêşkirin
Tîrmeh 23 – 24	Qeyd ji xwendekarên Polên 5 – 8 re tê pêşkêşkirin
Tîrmeh 27 – 29	Qeyd ji xwendekarên Lîsê re tê pêşkêşkirin
Tîrmeh 29	Forma qeyda Veguhastinê li ser www.mybigyellowbus.ca berdest e
Tebax 14	Qeyda Veguhastinê tê girtin

Yek forma Qeyda Veguhastinê ji bo her yek xwendekarê guncaw tê xwestin. Carekê we ev danezan wergirt, hûn dikarin linkê bi kar bînin ji bo her yek xwendekarê xwe yê pêwîstî bi .veguhastinê dibîne

STS girêdayî bi danûstandinên domdar e li gel malbatan her ku em xwe amade dikin ji bo .Îlonê. Em ji bo sebra we ya berdewam spasiya we dikin

Pirsên giştî yê têkildarî-veguhastinê dikarin bi awayekî online bînin şandin bi bikaranîna [forma](#) Têkildarî Me bin li ser www.mybigyellowbus.ca an jî bi vekirina telefonê ya jimareya 519-649- .re 1160